

ÇILE 2022

Sindoqa Pîroz

Kurdish House London
Li Londonê Maleka Kurdan

Festîval 8 Caran Hat û Çû
Çi Ma Li Dû?

Mêrdîna Rengîn

The Hall

KURDÎ

HÊVIYÊN PAK Û DILÊN REŞ



TheHallKurdî

E-kovara çandî ya mehane
Hejmar 1, Çile 2022

Damezrîner

Osman K m rc 
Erol Bařak

Editor

Erol Bařak

R pelsazî

Ridwan Xelil
ridwanxelil@gmail.com

Bergsazî

GrafîKURD

*Trajediya li ser s nor  Poland   Belarus :
**Ko ber b ne qurbaniy n gengeřiya
di nauber a dewletan de***



*E-kovara The Hall Kurd  hesas e ku kovar di wext  xwe de b  weřandin.
Ji fikr n di gotaran de hatine parvekirin   ji rastniv sa wan niv skar bixwe berpirsin   ne mecb r in ku ew m na y n weřanger  
ed tor bin. Hem  gotar, niv s, p ęgotin, reklam, materyal   naverok n din bi niyeteke safi hatine amadekirin.*

NAVEROK



Pêşgotina
Edîtor

Erol Başak
4



Li Londonê ji bo kesên
bêmal 3 hezar pakêt
xwarina germ

The Hall Kurdî
18



Hêviyên bêguneh çawa
bûn hêsîrên siyasetên
qirêj?

Erol Başak
5



Tundiya li ser jinan!

Özgür BASUT
20



Sindoqa Pîroz

Necat Zivingî
8



Festîval 8 Caran Hat
û Çû, Çi Ma Li Dû?

Amedhesen
22



Kurdish House London
Li Londonê Maleka
Kurdan

Hevpeyvîn:
Osman Kômürcü
Erol Başak
9



Mêrdîna Rengîn

Menazir Aslan Kaya
26



Hevpeyvîn Ligel
Mamosteya Kurdî
Dîlan Çelîkerê

The Hall Kurdî
13



Emroo

Zana Zengenî
34

PÊŞGOTINA EDÎTOR

EROL BAŞAK

Silav dildar û xwînerên kurdî!

Di saleke nû de kovareke nû ji we re dibêje merheba. The Hall Kurdî li Londona paytextê Îngilîstanê bi jimara xwe ya yekem dest bi weşanê kir. Kovara me dê wek kovareke online mehê carekê were belavkirin.

Li vî welatî saleke min jî tamam bû. Bi qasî ku min di vê wexta derbasbûyî de çavdêrî kiriye, ji her deverê dinyayê ji her netewê xelk li vir hene. Bi çî awayî hatibin û bûne niştecî ne muhîm e lê ya muhîm hemûyan jî bi awayekî azad li vir civaka xwe ava kiriye. Zimanê xwe dijînin, çand û kultura xwe didomînin. Ev salek e ez jî bi vê hestê difikirim ku bi awayekî xizmeta zimanê Kurdî, netewa xwe, çanda xwe bikim. Her çiqas derheqê me kurdan de xebat û weşan gelek hebin jî yekser bi zimanê Kurdî weşaneke domdar û rêkûpêk nîn e. Zarok û ciwanên kurd nexasim yê ji Bakur bi pirsgirêka nasname û zimên re rû bi rû ne. Mezinan jî zimanê xwe an ji bîr kiriye an jî dikin ku ji bîr bikin. Lêbelê xebera ku hêviyên meriv geş dîke jî eve ku di nava civaka kurdî de xelk, bêtir jî zarok û ciwan, dixwazin zimanê xwe hîn bibin û bikarin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin, hay ji çanda xwe bibin. Hevpeyvîna me digel mamosteya zimanê Kurdî Dîlan Çelîkerê jî wek delîla vê yekê ye. Em jî bi vê kovara bi zimanê zikmakî dixwazin ji wan kesên Kurdîhez re bibin çavkaniyeke xwendinê.



The Hall Kurdî, meriv dikare bêje ku kovareke aktuel e. Tê de ji nûçeyan bigrin heya rûdanên li cîhanê, hevpeyvîn, gotar, tendirûstî, jin, wêje, sînema hwd. gelek mijar wê hebin. Xwînerên kovara kurdî wê di kovarê de ji serkeftin û hal û rewşa kurdên li Brîtanya û yê li her çar parçeyê Kurdistanê haydar bibin.

Wek malbata The Hall Kurdiyê em dixwazin li Brîtanyayê û nexasim jî li Londonê bibin deng û awaza Kurdan. Lewra London bajarekî qedîm e, li cîhanê paytext û navendeke sereke ye. Her wiha bi hezaran Kurd lê dijî.

Çima The Hall?

Hall, bi kurdî eywan e. Ji salonên mezin û fireh ku çalakîyên wekî konsert, semînêr lê tê dayîn re jî hall tê gotin. Bi her du awayî jî Hall cihê ku mirov ji bo armançekê li hev dicivin e. Di çanda kurdî de jî li gundan eywan cihê bînavdananê ye. Her wisa civat li eywanan kom dibe. Kovara me jî dê bibe wek eywanekê ku her kes bikare ji xwe re tê de cihekî bibîne û ji her aliyê cîhanê geşedanan, serpêhatiyan, nûçeyan ku Kurdan eleqedar dikin berhev bike û bigihîne xwînerên Kurdî.

Kovara me bê alî û serbixwe ye. Em dixwazin ji her fikrê, ji her perçeyê kurd werin li vir binivîsin, ramanên xwe bêjin. Di eywana me de ciyê her kesî heye.

The Hall Kurdî li ser xêrê be.

TRAJEDIYA LI SER SÎNORÊ POLAND Û BELARUSÊ

KOÇBER BÛNE QURBANIYÊN GENGEŞIYA
DI NAVBERA DEWLETAN DE



EROL BAŞAK

“

“Koçber di şikeftan de dimînin. Ji birçîna dimirin. Ji bo rehmê lava û fîzar dîkin. Lê ji bo Polandiyên dilreş dîtina vê tabloyê mîna diyariyeke ji cinetê ye. Hesta serdestiyê dide wan.”



Ev gotin ji hevpeyvîneke rojnameya Polandî Gazeta Wyborcza ne. Ev bi tena serê xwe nîşan dide ku Polandî derheqê penaberan de çî difikirin. Bi hezaran koçber ku pîrraniya wan kurdên Başûrê Kurdistanê bûn, di navbera Belarus û Polandê de asê man. Piştî têkiliyên dîplomatîk nêzî 4 hezar mihacîr bi balafiran vegehandin welatên wan. Lê hê jî bi sedan koçber li kampên eskerî yên li Poland û Belarûsê dimînin. Hal û rewşa wan ne diyar e. Destûr nîne ku rojnameger têkevin van kampan.

Gengeşiya di navbera Belarus û Yekitiya Ewropayê de rê li ber koçberan vekirîye

Havîna sala 2021ê li Belarûsê Alexander Lukashenko bi awayekî biguman dîsa hîlbijartin qezenç kir. Pişt re li wî welatî xelkê dest bi protestoyan kir. Lukashenko bi tundî mudaxele li çalakvanan kir û rikberên xwe jî avêtin hepsê. Dîsa Lukashenko ji ber ku rojnamegerên muxalif tê de bûn balafira RyanAir a Îngilîstanê bi darê zorê daxistin Belarûsê û rojnameger binçav kirin. Yekitiya



Ewropayê jî ji ber van rûdanan li ser Belarusê kirdarî dabûn sepandin. Wê heyamê wezîrekî Belarusê daxuyandibû ku ew ê vîzeyaya turîstên ji Iraqê hêsantir bikin.

Koçber çawa karî ji Rojhilata Navîn heya ber sînorê Polandê werin?

Li gorî lêkolîna Hêzên parastina sînor û peravên Yekitiya Ewropayê Frontexê, koçberên ku dixwazin ji Belarusê derbasî Ewropayê bibin ji Iraq, Afxanistan, Sûrî, Lubnan û Somaliyê ne. Piraniya van penaberan xelkê herêma Kurdistanê û Rojava ne. Ligor nûçeyên BBC, Reuters, DeutscheWelle û rojnameyên Almanî li Bexda û Hewlerê ofîsên ku bi hêsantî vîzeyên turîstîk ên Belarusê didin ve-bûne. Bi alikariya qaçaqxçiyên mirovan koçberan bi çend hezar dolaran vîze û bilêtên balafirê eyar kirine û heya Mînska paytextê Belarusê hatine û ji vir jî bi wesaitên ku qaçaqxçiyên ji wan re eyar kirine çûne ber sînorê Poland û Lîtvanyayê. Seferên balafirên ji Erbîl, Bexda, Dubaî, Stenbol û Beyrutê hatine kirin.

Li gorî lêkolîna ku ajansa nûçeyan a Reutersa Îngilîz derbarê krîza koçberiyê de daye kirin û li gor daneyên Flightradar24ê dibêje Şirketa Rêhewayê ya Belarusê Belavia û Şirketa Rêhewayê ya Tirkî THY di mehên bihar û havînê de di navbera

Stenbol û Mînskê de seferên xwe zêdetir kirine û koçber anîne Belarusê. Şirketa Belaviyê di Sibata 2021ê de 28, di Adara 2021ê de 31 sefer di navbera Mînsk û Stenbolê de kirine û ev hejmar di Tirmehê de bûye 65. THYê jî di Adar û Nîsanê de li ser he-man rotayê 32 sefer kirine lê di Tirmeh û Tebaxê de 64 sefer kirine. Her du şirketên rêhewayê di Cotmehê de bi tevahî li Mînskê 124 sefer pêk anîne.

Koçber bûne qurbanî

Welatên Ewropayê, Belarusê ji bo berjewendiyên we bikaranîna koçberan succar dikin û dibêjin li pişt Lukashenko serokdewletê Rusyayê Putin heye. Li gorî analîst û pisporan Rusya dixwaze bala cîhanê ji ser Ukraynayê bikşîne ser meseleya koçberan û helwesta Yekitiya Ewropayê ya li dijî penaberan. Wekî tê zanîn Rusya li ber sînorê Ukraynayê esker bi cih dike. NATOyê, herwiha Amerîkayê jî li welatên Baltîk; Litvanya û Letonyaya ku beşdarê NATOyê bûbûn, esker bi cih kiribûn û herwiha nêzî Rusyayê bûn. Ev yek Rusyayê aciz dike û jixwe Putin nerazîbûna xwe fîne ziman. Ji loma jî analîst dibêjin bi vê hamleyê Rusya dixwaze Yekitiya Ewropayê bixe tengasiyê.

Helwesta Polandê li dijî penaberan çima tund e?



Meseleyeke ku lazim e bê zanin jî ev e ku di vê qeyrana koçberan de ti tēkiliyên Polandê bi cîranê xwe Belarusê re tune ye û Poland naxwaze pê re tēkiliyê deyne jî. Aboriya Belarusê pabendê bazirganiya bi Yekitiya Ewropayê re ye. Mal û berhemên Rusyayê jî dîsa ji Belaruê diçin Polandê û ji wir diçin welatên Yekitiya Ewropayê. Heke Poland bixwaze dikare sînorê xwe ji vê transît re bigre û aboriya Belarusê tēk bibe. Lê nake. Çima? Sedem jî ev e: Qeyrana koçberan ji bo siyaseta hindurîn bi kêrî hikumeta Polandê tê. Ev ji bo wan fersend e. Lewra piraniya xelkê wan penaberan naxwazin. Hikumet jî bi hestên neteweperest tevdi gere û wisa nîşan dide ku ew dikarin welatê xwe, sînorê xwe biparêzin. Birçîmayîn an jî mirina koçberan a ji ber sermayê ne xema wan e. Li gorî anketan li Polandê piştî van bûyeran piştgriya ji bo hikûmetê zêde bûye.

Kurdên başûr çima dibin koçber?

Li gorî daneyên saziya parastina sînorên Yekitiya Ewropayê Frontexê ji sedî 70-80yê koçberên ku dixwazin derbasî Ewropayê bibin kurdên Başûr in. Koçberên ku ji Reutersê re axivîne bersiva vê pirsê wiha didin:

- Derfetên kar li herêmê kêman.
- Di îşên heyî de pere kêman e ji bo debarê têrê nake.
- Êrîşên balafirên şer li ser endamên PKKê yê li gundên ber sînor xelkê ditirsîne û xelk ji wan deran koç dike. Bes ji Şeladizê dora 400 kesî ji ber vê hicetê koç kiriye.

Eşkere ye ku koçber di lîstikeke qirêj a siyasetê de bûne dîl, bûne qurbanî. Li aliyekî Lukashenko ji bo provokasyonê penaberan bikar tîne li aliyê din jî hikumeta Polandê ji bo siyaseta navxwe bi tundî û miemeleyeke durî mirovahiyê mudaxeyê li koçberan dike. Koçberên reben jî bê çare li derve û di serma yê de mane.

Wekî Mueyed Teyîb gotî:

Ne Mirinê Ez Divêm Ne Min Jiyan

Ez

Du destên bê dil im,
Di nav vê deryaya har da.

Ji bo çi ye
Avjeniya min?

Werin, ey hemî hovên avî!

Werne min!

Di nav vê deryaya swîr û tal da,

Şirîntir ji xwîna min,
Çi heye?

Ez

Du piyên bê ser im,
Di nav vê daristana tarî da.

Ji bo çi ye
Beza min?

Werin, ey hemî hovên bejî!

Werne min!

Di nav vê daristana pîr û kal da,

Terrtir ji goştê min,
Çi heye?





SINDOQA

PÎROZ

■ NECAT ZIVINGÎ

Bêdewletîyê pišta me şikandîye. Çend hezar sal in nav û dengê me heye. War û welatê me, çand û hunera me, zar û zimanê me, bîr û bawerîyên me, dezge û desthilatên me hene. Lê dewleta me tune ye. Bi awayekî de facto, em haymatlos in. Bi wê xezebê ku, bêdewletbûna me jî ne fermî ye. Nav lê nehatîye kirin. Lewma di şik û gumanê de, windayî ne em. Hene, lê tune ne. Ne bihûştî, ne dogehî ne. Araf jî bi para me neketîye. Welatê me dagirkirî, kolonîzekirî ye. Lê bê his û pêjin. Bê nav û pêname. Em nikarin ti kirasî li xwe bikin, ji bo bikarin sengerê xwe bizanin û bi derfetên wî sengerî li ber xwe bidin. Gêjbûna me ne suprîz e. Ji paş ve em dehf dane nav heyûlayekê. Erê! Em gelê sîmûlasyonê ne. Di matrîksê de dijîn. Lewma her yek ji me bi hezar gumanî ye, her yek ji me bi alîyekî de dikişkişîne. Bêhna me ji hev re teng e, awirên me ji hev re tûj. Kes ji ti tiştî ne ewle ye. Bêdewletîyê pišta me şikandîye.

Em bi saxî veşartin. Ne mirin, lê mîrata me li hev parvekirin. Sed sal berê dema hemî gel û netewe, bûn malxweyê mala xwe, bi rêya xwe de çûn, em li çar dewletan dabeş kirin. Tirk û Erebi û Faris bûn mîratxurê me. Sed sal in tu rê nema ne ceribandî ji bo helandina me. Da em tevî madeya wan bibin. Em bi sedhezaran kuştin, bi deh hezaran wargehên me şewitandin, bombe bi ser dar û berên me de barandin, avên me çiqandin, kêl û kevirên me şikandin û di bin avên bendavan de hiştin, destxet û destnivîsên heyî winda kirin, heta gazên kîmyayî li ser me ceribandî. Li hemî mizgeft û



mekteban eyar li serê me pêçan, mêjîyê me kelandin, bi sedhezaran mankurt ji me gihandin. Em bi saxî veşartin.

Em, di ti goran hilnehatin. Nevîyên Rustemê Zal, qey ji ava nemirîyê vexwarine, dîsa û dîsa bi ser xwe ve hatin, zarokên rojê piştî her şevê hilatin. Na! Ev ne xewn, ne jî xweşkirin e. Ne xwestek, ne jî xweferzkirin e. Li erdnîgarîya ku Sumer û Asûr lê winda bûn, piştî tofan û qiyametê dîsa em mabûn. Her carê li xwe hay bûn. Bi hêz û hêvî rabûn. Em, di ti goran hilnehatin.

Em, roj û agir in. Ji me dizê, ji me hiltê, ji me pêdikeve. Işq e. Bi pêtan re reqsê dikin perwaneyên me. Agir di av û gil dikin, qelban ji qelban hil dikin. Welê ye; li hewinga xilas nabin şêr, naçike bîr. Me jî tim hene; çelebî, mîrze û mîr. Agirgeh in dilê me. Di dil da heye narek ku disojit seqerê. Du şehsiwarên agir in; Xanî û Cizîrî. Em, roj û agir in.

Vaye sindoqek li ber destê me ye. Sindoqeke çî pêwîstîya me heye, ji pêşîyên me, tê de ye. Lê ne bi sêhr, ne jî pîroz e. Ger dewleta me hebûya, ji zû de ev sindoq dihat vekirin û gencîneyên tê de, mîna dareke rehên xwe bi axa me de berdaye, niha şaxên xwe li çar alîyên cîhanê vedida. Di qubeya asîmanî de xulxulîna me, li banê gerdûnê ala me. Heya niha me heqê wê neda. Yê bala xwe danê herî zêde bi pey nexş û xemlên wê, made û metalên wê ketin. Yan jî pesnê wê dan û pîrozkirin. Her, pesn û pîrozî. Me baş bala xwe nedayê bê çî tê de ye. Çî şîfre, kod û nameyên nihênî... Bi çî qewlikan hatine veşartin. Dem e. Mirovahî giha serdema dijîtal. Vekin êdî. Nebe, bişkînin wan qufleyên zingargirtî. Mîna qalikên gûzê. Belkî bişkê bextreşîya me ya bêdewletîyê. Vekin devê vê sindoqa pîroz.

KURDISH HOUSE LONDON

LI LONDONÊ MALEKA KURDAN



HEVPEYVÎN: OSMAN KÖMÜRCÜ-EROL BAŞAK

Kurdish House London (KHL), em dikarin wiha wergerînin -Mala Kurdan Li Londonê- ji aliyê hermeteke Îngilîz a bi navê Belinda Perimanê ve hatiye damezrandin û mebesta wê ew e ku ji Kurdan re, nexwasim ji Kurdên li Brîtanyayê re, bibe alîkar da ku ew karê xwe ava bikin, pêş bikevin, civaka wan xurt be. Kurdên ji çar perçe Kurdistanê û ji deverên din ên cîhanê gava ji bo xwendinê an jî ji bo avakirina kar û xebatê tên Londonê bi alîkarî û şewirmendiya Kurdish House Londonê dikarin bigihên armancên xwe an jî têkiliyê bi sazî û dezgehên re deynin. Em bi Dîrektora Bername û Ragihandinê ya Kurdish House Londonê Zeynep Binbogayê re axivîn ku ew bixwe jî kurdeke ciwan, zîrek û jêhatî ye. Wê bi kêfxweşî bersivên pirsên me dan. Va ye hevpeyvîna me û hûnguliyên derbarê Mala Kurdan Li Londonê.

Em gelek kêfxweşin ku îro em bi te re hatin ba hev û emê derheqê organizasyona we de biaxivin.

Spas ji bo kubariya we.

Par gava nû hatim Londonê, min xwest hinek lêkolîn bikim ka li vî bajarî ji bo Kurdan çi heye? Çi sazî an jî dezgeh hene ku divê meriv pê re bikeve têkiliyê. Gava li ser internetê min lêkolîn dikir yekser malpera Kurdish House Londonê derket pêşiya min.

Ji kerema xwe ji bo kesên ku hê we nas nakin dikarî hinek behsa Kurdish House Londonê bikî? Saziyeke çawa ye? Karên çawa dike?

Belê. Helbet. Lê ewilê ez dixwazim vê bejim, te gava di googlê de derheqê kurdên li Londonê de lêgerîn dikir em dîtine. Nexwe SEO ya me gelek baş e. Vê yekê ez şa kirim.

Hemû kar û daxwaza Kurdish House Londonê ew e ku fikr û xeyalên her kurdekî derbarê avakirina karekî de bibe rast û ew kes bigihên armancên xwe. Ev dikare bibe sermayexistina muteşebîsekî an jî mezinîkirin û pêşxistina karê wan be. Û an jî em aliyê kurdên ciwan dikin ji bo tercihkirin û pêşxistina kariyerên wan.



► Zey Binboga



Ev tevgerê e, an platformek e?

Ev toreke mirovan e. Em hez dikin ku werin ba hev, ji bo fikr û planên xwe aliyê hev bikin, çirûska hizrekê vêxin û bi mirovan re pêwendiyê çêkin. Û niha hêj ku pêkan e çiqas ji destê me bê em li hev dicivin û bi hev re dixebitin.

Baş e, armanca we çi ye?

Organizasyona me dixwaze civaka Kurd ji hêla aborî ve hêzdar bike. Em gava xebat û projeyên watedar dikin, em dibînin ji hêla civakî û mêjiyî ve jî feydeyên wê yên pozîtîf hene.

Ji bo vê armancê hun çawa dixebitin?

Di sê kategoriyan de ez dikarim ve-bêjim.

Ya yekê, em rasterast û yek bi yek alîkariyê didin her tiştê ku bi kar re eleqedar e. Ji pêşxistina CVyan ji bo kar bigrin heya peymanên xebat û tedarîkê, plankirina destpêka karê we û çawaniya îdarekirina şîrketa we em dibin alîkar.


Ya didoyan bi awayekî rêkûpêk em bernamêyên perwerdehiyê pêşkêş dikin hem online hem rû bi rû, em hevdîtin û workshopan saz dikin.

Ya sisêyan, em ji bo pêşketina karîyer û şîrketa we alî dikin ku hun bikarin bigihên çavkaniyan. Me alîkarî da 10 Kurdan ku li Impact Hubê beşdarî bernamêyên destpêkê bibin. Di wê programê de kesên din jî hebûn lê piranî kurd bûn û em bi vê yekê ser bilind in. Herwisa di pratîkê de bernamêyê mîna ku ji bo kurdan be xuya dikir.

Gelek spas. Fikra organîzasyonêke wiha çawa peyda bû?

Pirseke gelekî xweş e. Ez dikarim bêjim ku ji vê fikrê afirî. Kurdên ku ji welatên cuda hatine vir, çawa dikarin li hev bicivin û ji bo pêşxistina karê xwe aliyê hev bikin?

Lewra aşkerekê ku li Londonê kurd nikarin ji balyoxane an jî mîsyonên tîcarî yên welatên ku ew jê hatine piştigiriya pêwîst werbigrin. Ji ber vê me got bila ziman, herêm, siyaseta li aliyekî bimîne, em hemû kurdên ji çar parçey-



an bînin ba hev, bila bi hev re bixebitin û yek yekî din bihêztir bike. Ji roja me dest bi xebatê kir heya niha her tişt bi Îngilîzî bû. Ev tê wê wateyê, her kurdekî bi zaravayekê diaxife an jî yên qet kurdî nizanin karîna tê de bin.

Baş e, kê ev organîzasyon damezrand? Ez bawerim xwînerên me jî di-xwazin vê dosta Kurdan binasin.

Ev organîzasyon hermeta Îngilîz Belinda Perrimanê ava kir. Ew berê di şîrketêke gewre ya neftê de dixebitiya ku ew şîrket li seranserê cihanê projeyên qerase birêve dibe. Lê di sala 2015an de Belindayê wisa hîs kir ku bi piştigiriya di warê kar û aboriyê de dikare alîkarî li kurda bike û loma ji karê xwe derket. Belinda li herêmê gelek salan ma, geriya, rojhilatê Tirkîyê, rojavayê Îranê, herêma Kurdistanê Iraqê ziyaret kir û rewşa li wan deran dît û jê haydar bû. Ew li Londonê beşdarî bi dehan çalakîyên kurdan bû. Herwisa ji xwe pirsîye ji bo vê civakê çi bike dê bi kêr were? Piştî di Newroza 2016an de li Impact Hubê wê ev organîzasyon ava kiriye.

Ez ji aliyekê ve meroq jî dikim çima we navê vê orgaznîzasyonê 'Mala Kurdan' danî?

Beriya her tiştî ev organîzasyon ji bo her kesê/a ku xwe wek Kurd bi nav dike an jî aliyê gelê Kurd dike ye. Têgeha mal ji bo wê yekê ye ku em wek malbatekê tevdigerin. Em ji hev re gelekî qenc in û li ba hev rehet in. Em bi "modela piştire bide" dixebitin. Çi ye ev model? Li gorî vî modela gava we ji me piştgriyek stand, hezkî ev alîkariya destpêkirina bernamêya nasandinê be, hezkî ev alîkariyek ji bo plangeriya karê we be, em berdêla wê de bes ji we daxwaz dikin ku gava îmkana we çêbû hunê jî alîkarî li kesên di vê torê de bikin.

Em di civata muteşebîs ya Londra enerjîk de operasyonê dikin. Bi piranî me li Impact Hubê xebat kir, lê niha em li The Conduit dimînin ku li Covent Gardenê li nêzî rawestgeha metroyê ye. Cîheke zehf şêrîn û 5 qatî ye. Ev der cihê afirînerî û guherînan e ku ew di civakê de tiştên wisa çêdikin ku mirov dixê nava kelecane û heyîrî dihêle.

Di van 6 salan de we çi xebat, çalakî û proje bi rê ve birin? Ji kema xwe dikarî çend mînak bêjî?

Me alîkarî li gelek cure sazî û şîretan kiriye ku ji aliyê Kurdan ve tên

birevebirin. Me alîkarî da gelek kargehên kevneşop yê ku kurd dişûxulînin. Di nav wan de deranîn/derfirotin, paqijîya zuha, şîrketîna însaatê û ez bêjîm şîrketêke texpîvanîyê jî heye. Herwiha ji bo serlêdanên hîbeyê me alîkarî dan sazîyên xêrxwazîyê yê ku Kurd birêve dibin. Em ji afirandinên nû û armancên civakî hez dikin û wana teşwîq dikin. Herwiha em aliyê rêxistinên dikin ku ji kovarên online, film û berhemên hunerî hatînyekê bi dest xî. Di sala 2021ê de di çarçoveya projeya îstîhdamkirina ciwanên kurd de me xebatên mehane yê atolyayê meşandin. Me ciwan teşwîq kirin ku di jiyana kar de bi rastî jî tişta ku ew giringiyê didinê û ji wan re hewce ye derkeve holê. Ji ber pandemiyê me li ser zoomê ev kir û me ew gihandin akademîsyenan.

Gava te got akademîsyen qesta te akademîsyenên kurd in an yê din jî tede ne?

Yanî em aliyê wan kesan dikin ku xebata wan derheqê kurdan da ye an jî em li çend zanîngehan, li xebatên spesîfik û akademîk tora xwe didin nasîn. Di tora me de akademîsyenên kurd jî hene.

Gelek xweş e. Baş e mirov çawa dikare têkeve Kurdish House London? Divê meriv bibe endam an?

Endamî niha înfomal e. Di sala 2022yan de em ê vê bikin fermî.

Lê aniha ji bo me endam ew kes in ku di nava torekê de bi me re danûstendîna dikin, bi awayekî rêkûpêk beşdarî çalakîyên me dibin. Yanî hezkî tu kurdekî xwedi fikrekê bî, hezkî kargeheke te ya piçûk hebe, hezkî tu kurdekî ciwan bî û alîkariyê bixwazî. Ev alîkarî dikare tespîtkirina şarezayîyên te be ji bo destpêkirina kariyerekê, an jî dikare pêwendîdanîna bi pîspor û profesyonelên Kurd re be. Ev hemû rêbaz in. Her kî bixwaze ku tevî tora me bibe, bila ji me re e-posta bişîne. Hemû hûrgulî di malpera me de hene: kurdishhouselondon.com

Civînin we yê bipergal çêdibin gelo? Heke hebe hun li kû û çawa vana pêk tînin?

Belê her hefte li The Conduit Covent Gardenê em seansên rûbirû dikin. Wekî din 2 hefteyan carekê ji bo endamên me yê ku li derveyî vî welatî ne, em li ser zoomê civînen xwe dikin. Di derheqê mijarekê de ji endamên me pîsporek diaxive û ew seansê bi rê ve dibe.



Me bişopînin û ji ser van platformên medyaya civakî bi me re pêwendiyê deynin: Twitter, Instagram, LinkedIn û Facebook. Hun dikarin e-maîlê ji me re bişînin ji bo organizekirina civîneke rûbirû li ser zoomê da ku em bikarin bêtir we binasin û xwe bidin nasîn û bizanin ka tiştekî çawa we divê li ser bixebitin û em çawa dikarin alîkariya we bikin. Destpêk wiha çêdibe.

Kesekî ku bixwaze ji piştgriya we sûtê werbigre divê li Qiraliyetên Yekbûyî (UK) be an firq nake li kû derê dijî?

Alîkariyeke çî astî tu dixwazî? Ev bi rastî girêdayê vê ye. Seranserê pandemiyê xebatên me wek navdewletî ji ser zoomê dewam kirin. Em alîkariya zêdetir û demdirêj dikarin bidin kesên li vî welatî jîyan dikin. Lê em hewl didin bigihên her kesî ku xwe kurd binav dike. Bi rêya medya civakî û e-maîlê, xwe bigihînin me. Hun dikarin emaila me ji malpera me peyda bikin. Hesabên me bi navê Kurdish House London li Instagram, Twitter û Facebookê hene.

Niha li seranserê cîhanê şewbek heye. Mezintirîn aboriyên li cîhanê jî jê tesîrdar bûn. Lê li welatên ku kurd lê dijîn jîyan bihatir û rewşa aboriyê xirabtir e. Û di ser de şer û koçberfî jî dîsa ketiye para kurdan. Gava tu van hemûyan bidî ber çavan çî dikari bêjî ji ciwanên Kurd re ku hedefekê wan heye?

Her çiças hun di rewşeke dijwar de bin, fikra we çî dibe bila bibe, tim û tim bifikrin ka hun dikarin çî bidin civakê. Wekî din, ji xwe, ji fikra xwe bawer bin. Li derûdora xwe kesên ku we radikin jorê bicivînin, ne yên ku we dikşînin jêrê an jî fikra we piçûk dihesibînin. Ew cure mirov dizên xeyalan in. Gava hûnê gaveke mezin bavêjin, tiştekî bi ser xî hunê nexwezî ew kes li cem we bin. Gava min hawirdora xwe guherand, min dît projeya min kar dike û min encamên wê dîtî. Ji aliyê din ve kesên ku ji we re dibin îlham bibînin. Têkiliyê deynin bi wan re. Dibe ku ew kes YouTuber bin. Her çiças hun negihîjin wana jî hun dikarin wana bibînin. Û xwe bigihînin me, em dikarin we bigihînin kurdên ku îlhamê bidin we.

Em hatin dawiyê, tiştekî ku dixwazî lê zêde bikî heye gelo?

Belê heye.

Fermo bêje.

Bi taybetî ji komele û rêxistinên kurdan re dixwazim tiştekî bibêjim. Bila bifikrin ka çawa karin rêxistinên xwe ji hêla siyaset û olê ve bikin bêalî. Wek mînak em komeleyeke apolîtîk in. Em ji hemû endamên xwe yên xwedî fikrên cuda re rêzdar in. Armanca me ne siyaset e ne jî ol e. Organîzasyona me ji bo kar û hewcedariyên avakirina karekî hatiye damezrandin. Em wiha xebitî û wisa me karî ji her herêmê Kurdan bikşînin tora xwe. Di nava me de ji Bakur Kurd hene, ji Başûr hene, ji Rojhilat û Rojava kurd hene. Ev tiştekî derasayî ye lê xweş e. Loma ez dixwazim rêxistinên kurdan teşwîq bikim, bila bifikrin ka çawa dikarin bigihên kurdên ji her aliyan ku tevî rêxistin û çalakiyên xwe bibin. Lewra ev gelek xweş e û nîşan dide em çiças civakeke dewlemend û rengîn in.

Ez gelek spas dikim Zeynebê, ji bo suhbeta xweş û bersivên te yên ji dil.

Ez spas dikim.



HEVPEYVÎN LIGEL MAMOSTEYA KURDÎ **DÎLAN ÇELÎKER**

HEVPEYVÎN: THE HALL KURDÎ



Di sala 2020î de ji Tirkîyeyê bi deh hezaran kes serî li Peymana Enqereyê da. Serlêdana bi hezaran kesan hate pe-jirandin. Li gorî vê peymanê ew jî hatin li Britanyayê sirket ava kirin û bûne karsaz. Dîlan Çelîker jî yek ji wan e. Li Londonê dersa zimanê kurdî dide zarokên Kur-dan. Lê ne tenê zarok ji mezinan jî gelek kes dixwazin fêrî zimanê kurdî bibin.

Dîlanê çawa dest bi dayîna dersên kurdî kir? Li Londonê daxwazî ji bo dersa kurdî çi ye? Hedef û armancên wê çi ne? Me digel Mamoste Dîlanê sohbeteke xweş kir. Kerem kin.

- Dîlan, Tu jî bi trêna “peymana enqerê” hatî vira. Tu bi çi niyetî hatî Londonê?

Belê, ez jî bi peymana enqerê hatim. Beriya werim Îngilîstanê ez di zanîngehê de bûm. Asas sedema hatina min a vira temamkirina xebatên akademyê bû ku nîvco mabûbû. Di çarçoveya peymana Enqereyê de min plana xebata xwe li ser perwerdeya zimên çêkir. Armanca min ew bû ku dersa zimên bidim li civakên Kurd û Tirk.

- Mamoste, Tu li vir karekî pîroz dikî. Bi rastî bi min wisa ye. Te çawa qîrar da ku li Londonê dersa kurdî bidî? Li Tirkîyê jî te dersa kurdî dida an?

Di sala xwe ya ewil de ez li derveyî Londonê bûm û min dersa zimanê Tirkî da zarokên Tirk. Piştê min bar kir hatim Londonê. Li vir jî tirkî bêtir, daxwazî ji dersa zimanê Kurdî re çêbû. Bi rastî ev yek ez kêfxweş kirim. Zimanê kurdî asîmîle bûye. Li Tirkîyê min dersa kurdî ne dida lê axir ez kurdî dizanim û mamostem e loma dikarim dersa zimanê kurdî bidim. Wek kurdekî bi vê xebatê şanazim.

- Ji çi astê şagirtên te hene? Em bêjin tev zarokên an mezin jî hene? Bi giştî çend polên te yên dersê hene?

Min bi dersên taybet dest pê kir. Lê niha li ser daxwaza hin sazî û komeleyên Kurdan li cihên wan dersê didim. Şagirtên min ji 2 koman pêk tên. Zarok û mezin. Niha li 3 saziyan dersên min hene û bi tevahî 6 pol hene.

- Tu çawa şagirt dibînî? An jî ew çawa xwe digihînin te? Çimkî di vî karî de bi min belkî tişta herî bi zehmet ev e. Ne wisa?

Cara ewil ku min dest bi kar kir min îlan da çend rojname û malperan. Şagirtên ewil wisa çêbûn. Piştê ev kes bûn referans û sazî û komele xwe gihandin min.

-Ez vê yekê jî merak dikim. Dersên te çawa derbas dibin, bi taybetî bi zarokan re? Hînbûna zimanê kurdî li ser wan tesîr û guherînekê çêdike gelo?

Heta niha dersên min bi kêf derbas bûn. Ji bo fêrbûna zarokan gelek muhîme ku ders bi kêf û şahî derbas bibe. Zarokên ku tên dersa min qet kurdî nedizaniyan. Û di ser de gelek şagirtên min tirkî jî nizanin. Loma em bi îngilîzî gelek caran qise dikin. Ez lîstikên kurdî li ber wan hîn dikim. Keçeke 6 salî heye di pola min de. Gelek şermoke ye û bi kesî re xeber nade. Min ji bo wê



ji çanda kurdî hin lîstik amadekirin. Gelek jê hez kir. Edî guherî di dersan de çalak e. Diya wê got li dibistanê jî êdî bi hevavên xwe re diaxife û dilîze. Mamosteya wê jî gotiye guherîneke baş pê re heye. We çî kiribe her lê berdewam bin. Wekî din bi mezina re jî, digel dersa zimên, ez behsa çand û kelepura kurdî jî dikim.

**- Li Londonê çiqas daxwazî-hewce-
darî bi dersên kurdî heye? Li gor-
têhmînên te çi dikarî bêjî?**

Li Londonê hejmareke zêde Kurdên ji Tirkîyeyê hene. Ciwanên ku li vir çêbûne di nava krîza aîdiyetê de ne. Ne bûne Kurd, ne Tirk in ne jî bûne British. Lê ji aliyekê ve li nasnameya xwe ya kurdî jî digerin. Loma eleqe nîşanê dersa kurdî didin. 2 şagirtên min ên ciwan hene. Yek xortekî 21 salî ye, ya din jî keçeke 24 salî. Her du jî hem ji bo debara xwe û hem jî ji bo bikarin dersa kurdî hildin dixebitin. Qet ji dersê namînin. Zû hîn dibin. Xortê jêhatî li malê jî zorê dide dê û bavê xwe da ku

bi kurdî qise bikin. Ew li ber mezinên xwe hîn dike niha.


**-Baş e eşkereye ku eleqe ji dersên
kurdî re heye. Ji bo vê salê projeyên te
yên nû hene gelo? Yanî ji bo tu bikarî
bigihê zêdetir kesan û bi awayekî pro-
fesyonelî vî karî bimesînî.**

Belê helbet heye. Bi navê 'Dilan Teaching' şirketa min heye. Ez li ser medyaya civakî digihême gelek kesan. Lê dixwazim bêtir bi profesyonelî bixebitim. Ji loma digel hevlekî xwe me projeyek amade kir. Ji bo sosyalbûna ciwanên kurd, têketina wan a nava civakê, hînbûna zimanê zikmakî û derketina ji krîza nasnameyê. Me serî li fonekê da. Hêvîdarim ew derkeve û em ê cihekî xweş hazir bikin ji bo van armancan.

**Dîlan Çelîker, Saet xweş. Ji bo te her
serkeftinê dixwazim. Gelek spas.**

Ez spasiya te dikim ji bo hatin û eleqeya te.







**Dilan
Teaching**



JI BO KESÊN BÊMAL 3 HEZAR PAKÊT XWARINA GERM DIYARIYA KRÎSMIS Û SERÊ SALÊ

NÛÇE: THE HALL KURDÎ

Li Londona paytextê Îngilîstanê, li gor daneyên fermi, zêdetirê 11 hezarî mirovên bêmal hene ku ji wan re dibêjin homeless. Exlebên wan li derve li ser kolanan radikevin. Di vê krîsmisê de komeke dilxwaz ku pêşengiya wan Ibrahim Dogus dike, ji bo wan xwarina germ amadekir.

Ibrahim Dogus kurdekî xelkê Mer-aşê ye, ev 27 salin li Brîtanyayê dijî. Wek siyaetmedar û karsazekî li vir çanda alikariyê didomîne. Ev du sal in jî di çorçoveya kampanyaya #helping-hands (destên alîkar) de ji bo mirovên bêmal xwarina germ dide amadekirin û ew bixwe jî hem amade dike hem jî digel xêrxwaz û dilxwazan li hewcedaran belav dike.

-Her salê carek di meha 12an de dora krîsmisê em li otêla Park Plaza Westminsterê li navenda Waterloo ji

bo kesên bêxanî yên ku li derve li ser caddeyan dimînin û malbatên ku îmkânên wan teng e, em ji wan re xwarin çêdikin. Otêl ji me re dipijîne, ew çêdikin. Em bi kesên endamên parlamen rojnameger û karsazan re tîn ba hev û wek pakêt hazir dikin. Û hevalên me yên din jî tîn ji otêlê vana ji me digrin û dibin belav dikan. Ev du sal in gelê Brîtanî û gelên ji hemû cîhanî di tengasiyeke mezin re derbas dibin, bi taybetî ji ber kovîdê û tiştên girêdayî kovîdê jiyana baş naçe ji bo bi deh hezaran kesan. Û Em jî dixwazin bi awayekî piçûk piştgrî bidin wan kesan ku ji wan re alîkarî lazim e.



Ibrahim Dogus çanda alikariyê ku çandeke kurdî ye jî li Brîtanya didomîne û dibêje wî beriya pandemiyê di kafeya xwe de alîkarî dida kesên hewcedar lê ji ber kovîdê kafe hatiye girtin.

-Beriya ku em vî karî bikin sala borî. Min kafeyeke piçûk vekiribû li Waterloo. Waterloo ciheke mezin e, mezintirîn stejšina trênan a Londonê li Waterloo ye. Li wê derê kesên ku li ser caddeyan radikevin, mirovên bê xanî, bê kar û bê malbalt zêde ne. Ji bo wan min kafeyeke piçûk vekirî bû. Ji ber kovîdê ew kafe hat girtin. Îmkan nebû ku em berdewam bikin. Ji bo wê yekê me xwest em tiştekî bikin, em nesekinin, bê çare nemînin û ji bo hinek însanan bibin çare. Tiştê ku me îro kir tiştekî piçûk e. Bi temamî belkî me 3 hezar pakê xwarin çêkirin îro. Ji bo 3 hezar kesî em îro nanekî dişînin. Tiştekî piçûke lêbelê tiştek e. Em dixwazin van tiştan zêde bikin. Sala borî 2 hezar xwarin bû, îsal bû 3 hezar. Sala bê înselleh ewê bibe 5 hezar xwarin. Gav bi gav emê vî karî pêş bixin û kesên din jî em ê tevî vî karî bikin. Çiqas alîkarî em bigihînin kesên hewcedar ewqas baş e.

Ji bo kesên homeless hem xwarina normal hem jî ya vejeteryan hazir dikin.

-Îro mirîşk û xwarineke vegetable kartol û gezer wan tiştan me amade kirin. Her sal tê guhertin. Yanî gora îmkana otêlê gora îmkana me, em çî bikaribin emê wê hazir dikin.

Ibrahim Dogus Endamê Partiya Karkeran (Labour) e û endamê meclîsa şaredariya Lambethê ye. Birêz Dogus digel kar û xebatên siyasî xebatên civakî jî dimeşîne. Ew damezrînerê the Centre for Turkey Studies û Centre for Kurdish Progress e. Derheqê Tîrkiye, Iraq, Îran û Sûriyê de û taybet li ser rewşa kurdan çalakiyên siyasî, konferans û civînan jî saz dike.





TUNDIYA LI SER JINAN!

ÖZGÜR BASUT
OZGURBASUT@GMAIL.COM

Îro kuştina jinan dibe sedem ku li çar aliyê cîhanê bi hezaran jin ji mafê xwe yê jîyanê bêpar bimînin. Bêyî; Kuştina bi qestî, birîndarkirin, îşkencekirin, bêparkirina azadiyê, destdirêjiya cinsî, îstîsmara zayendî ya li ser zarokan, fuhûşa bi darê zorê ev hemû kiryarên nemirovane ne û sûcên li dijî mirovahiyê ne. Em di civakeke ku hîn jî fêhm nekiriye ku kuştina jinan sûcekî giran e de dijîn. Gelek bûyerên ku me nebihîstine hene, gelek cînyet, gelek îstîsmar di her wateyê de, di her astê de...



Ma ne wexta dev jê berdana ji lîstika sê meymûnan e?

Çima em qasî ku jiyana kesekî ji dest bigrin êrîşkar bûn? Rastiyek heye ku mirov bi çavdêrî û ceribandîna fêrî tundiya dibin. Mêr li ber çavên zarokên xwe li jina xwe dixê, kurê wî jî li binhişê xwe hegemonyaya mêr kod dike û li kûçikê xwe dixê, ji ber ku dibîne ku bavê wî ji dê, xwişk û ji wî jî bi hêztir e, ew jî ji kûçikê xwe...

Piraniya wan kesên ku şidetê li dijî jinan bi kar tînin di zarokatiya xwe de rastî tundiya dê û bavên xwe hatine, an jî di malbateke din av tevgerên bi tundî de mezin bûne. Ger em tevgerên tundî piranî li ser bingeheên xizanî, bêkarî û nelirêtiya exlaqî zêde dibin û derdikevin holê.

Roj derbas nabe ku li welatê me û li cîhanê jin neyên kuştin. Dem diguhere, zanist û teknoloji bi hêsankirina jiyana ve bi pêş de diçe, ev yek divê bi leza tundî û destdirêjiya li ser jinan kêmbike, lê her ku diçe zêdetir dibe.

Tundiya li ser jinan ji gelek kiryanan pêk tê; destdirêjiya devkî û şeweyên din ên destdirêjiya hestiyarî, îstismara laşî an zayendî.


Kuştina jinan ji kuştina mêran ji hin aliyan ve cûdatir e. Mînak, piraniya kuştinên jinan ji aliyê hevjinan an hevjinên berê ve tên kirin û bi tacîzek domdar re têkildar in. Gef an tehdîdkirin li malê yan jî li derve her dom dike.

Zehmet e ku daneyên rast ên li ser kuştina jinan werin berhev kirin. Ji ber ku welatên ku piraniya bûyeran, polîs û pergalên berhevkirina daneyên bijîjkî belge dikin, bi gelemperî li ser dozên kuştinê xwediyê agahdariya pêwîst nînin an jî rastiya rewşê rapor nakin.

Kuştina jinan ya ku ji aliyê mêr an hevalê demê an jî yê berê ve tên kirin bi awayekî tên zanîn.

Ev helwesta zayendperest jî li gorî her welat û çandî cûdatiyan nişan dide.

Mînak, tevî çarçoweyên qanûnî yê li seranserê Yekîtiya Ewropî yê ji bo pêşgirtina li cihêkariyê û pêşve-



birina wekhevîyê, jin hîn jî di biryargirtinê de kêmbûnê temsîl kirin. Helbet ev helwest û tevgerên zayendperest vê rewşa newekhevîyê kûrtir dike...

Çavên xwe bigrin û di nav kefen de li ser mermerekî sar velezayî xwe xeyal bikin. Şopên kêran li ser laşê we, birînek stûr li stûyê we. Ev dîmenek e pir nexwaşe ne wisa? Nerehetiyek e ku çav naxwaze bibîne û guh naxwaze bibihîze. Lê sere xwe di kîjan aliye de bizivîrînê xerabtir û bi êştir e...

Li gelo sedema tundî û şideta meran a ku di çaryeka dawîn a sedsala borî de bi riq zêde dibe çî ye?

Dibe ku em bersivan zanibin an texmîn bikin, lê em dikarin çî bikin?

Her jineka ku tê kuştin xwedî naveki ye. Ev nav jî bi qasî navên te bi qîmet û watedar in. Her yek ji wan xwadî xeyal û hêviyan e û bi daxwaza pêşerojê xweştir dagirtîne.

Mirov nikare bipirse, ji ku derê dest pê kir û çima berdewam dike?

Gelek tiştên em nizanin, em jê bê hayin hene. Rastiyek tê rûqalî me dibe; heya ku ev dinya hebe, jin û mêrê jî hey hebin. Ji ber wê divê jin û mêr fêrî jiyana bi hev re bibin. Lê diyar e ku di vî warî de kêmasiyên me hene.

Kêmkirina êşa jiyana di destê me de ye. Gava yekem bin pê kirina her cûre tundiya ye. Gava em ev yek pêk anî helbet jiyana hîn xweştir û azadtir bibe.

Bi hêviya dinyayeke ku çî jinek bi destê mêrekî neyê kuştin û neyê êşandin. Roja ku ev bû, ew dem em dikarin bibêjin ku dinya bi her awayî pêş ve çûye...

FESTÎVAL 8 CARAN HAT Û ÇÛ ÇI MALI DÛ?

AMEDHESEN

ahmethasan7@gmail.com

Ji destê mirovî bihata, dê xewnên xwe ne bi peyvên sînorkirî, dibû ku têteta nav hewildaneke yekser ya nîşandana dîmenan lewra xweştir û çêtir e ku ew tiştên hatiye dîtîn (xuyang, dîtbar) dîsa bi nîşandan û nimayîşê were vegotin yan ravekirin. Nivisandina li ser sînemayê jî meriv dixê nav dudiliya vê rewşê ku wêneyek, dîmenek, tabloyek, fotrafek, menzereyek bi nivîsê were neqilkirin. Bi van hişyariyên ji xwe re û ji we re, ez ê bikim ku li ser *8em Festîvala Fîlman ya Duhokê ya Navneteweyî* hin nêrînên xwe bibêjim.



Festîval ji 15ê meha Mijdarê heta roja 22yan, 8 roj li du cihên cuda –yek li aliyekî salona sînemayê li aliyê din eywana mezin ya Zanîngeha Duhokê-hate nîşandan. Di navê de atolye hebûn, wekî din jî çend mijarên sereke yên sînemaya kurdî tê de cih girtin ku ew babet, dûredirêj hatin niqaşkirin. Sînemaya kurdî di vir de derfeteke mezin ji xwe re ava kiriye; sînemakar û temaşevan û rexnegir li hev civandiye. Bi xweşî di hin cihan him beşdar him jî şahidê derdê produktor, derhêner, lîstikvan, montajkar, rexnegir yan jî temaşevanan bûm lê heyf ku exleba wan bi gilî û gazinc bûn. Ji hin gazincan diyar bû ku herçiqas 8em festîval be jî hin tiştên ku hêj nehata guhertin yan jî hêj hewce ye berev başiyê biçê, careke din ew gazinc belkî cara 8an e, hatin rojevê. Wekî piştgirîdayîna xurttir ya filman, perwerdehîya sînemakaran û li ser belavkirina filman.

Xebera xêrê ye û mizgînî ye, filmên kurdî ji bo ku êdî li ser platformeke online werin weşandin, xebateke pir-alî tê kirin. Ez bawerim beriya vê jî hewildaneke wisa hatiye kirin lê hêvî ji bo vê carê zêdetir in û bawerîya min jî. Festîvala Filman ya Navneteweyî ya Duhokê, Hikumeta Herêma Kurdistanê, Mîtos Fîlm û dibe ku hinek aliyê din jî di vir de cih bigirin ku tev bi hev re platformê ava bikin û malekê ji bo sînemakaren kurd çêkin. Tevî ewqas sînoren fîzîkî û hişî, problemên dijîtal jî ji niha ve wekî zehmetiyên mezin derdikevin pêşiya temaşevanan. Temaşevanek ji xeynî ku biçê festîvalan, welat welat bigere, divê li Başûr û diasporayê ger li ser gerê bike heta ku karibe, berhemên sînemayî bibîne. Jê taltir lîstikvan ango xebatkarên filman kengî karin filmê ku tê de xebitîne, bi çavên xwe bibînin?

Xebat û lêkolînên ku li ser sînemaya kurdî hatine kirin jixwe kêman in lê-belê yên berdest jî ne tenê ji ber rewşa polîtîk, ji ber rewş û şertên zimanî û çandî jî ji hev dûr mane. Bi tevahî 3-4 zimanên serdest û zimanê kurdî tevî zaravayên wê qadeke mezin datîne ber meraqdarên sînemaya kurdî. Tiştê



xuyaye divê ev wekî karekî demdirêj yê xizmeta sînema û çandê were kurdîkirin. Di encamê de kar û bar û arşîveke têr û tije dê were derxistin. Gelo, ev karê komxebatekê ye yan karê akademyê ye an jî yê festîvalan e?

Fîlmê Şewket Emîn Korkî *Ezmûn* (The Exam) roja pêşî wekî filmê destpêkê hate nîşandan. Fîlmekî ku heta niha xwerû bi “meseleyên malê” civak, jin û perwerdehîyê ve têkildar behs dike lê bi zimanekî herikbar yê sînemayê, bi rîtmeke bilind û li du xwişkan çîrok diçe û tê. *Ezmûn* tevî ku bi giştî zaravayê soranî û bi diyalogên dûredirêj hatibû dorpêçkirin jî hemû bala mirov li serê bû. Di ser de jî wekî hemû filmên ku di festîvalê de hatine nîşandan, binnivîs bi zimanê Îngilîzî bû. Ev jî qisûrek e li ber çavên min ku zimanê festîvalê bi giştî Îngilîzî ye û çî kurmancî çî jî soranî hêj nebûye zimanê festîvalê. Agahdarî û materyalên din yên festîvalê yan jî li ser medyayê zimanê kurdî hebû. Careke din ku meriv li ser filmê Korkî biaxive rewşeke asayî ya Başûr û wekî rexneyek li perwerdehîyê helbet di binî de jî kêşeyên li ber jinê hene. Korkî bixwe gotibû ku film ne li studyoyan tevî ku rexneyek e li perwerdehîyê jî li dibistanên Silêmaniyê hatiye kişandin û tu astengî ji bo vê nehatiye derxistin.

Havin Al Sindy him endama juriya metrajdirej bû him jî karên hunerî yên festîvalê kir û çêkirina poster jî di navê de li ser jîngeh û keş û hewayê trailerê festîvalê çêkir.

Jurîya ku ji Hüseyin Tabak, Zübeyde Bulut, Salem Salawati, Elise Van Marcke û Dirk Schafer pêk hatibû, di beşa filmê metrajdirêj de xelatê dan *Sidîq û Piling*. Derhêner Rêber Doskî ajal û xweza, jîn û jîngeh, welat û azadî çiqas bi hev ve ne, kiriye ku em bibînin. Lewra 25 sal li benda dîtina pilingan dimîne û gava piling tê dîtina digihîje mirazê xwe. Êdî parastin ax û xwezayê dê karibe bigihîne dinyayê.

Jurîya ji Talal Derki, Bavi Yasin û Shamal Sabri pêk dihat xelatê dan belgefîlmê *Nanê Pîroz* yê Rahim Zabihi. Jiyana kolberên (qaçaxçî) li ser sînorê Îranê, yên ku 20-30 kîlo eşya li pişt xwe dikin û di ber û serê çiyayan diçin ku rastî esker û serbazan neyên. Lê kolberî çiqas dijwar be, ewqas e; ne kêman ne zêde.

Jurîya kurtefilman Camilla Larsson, Apo W. Bazidi û Zahraa Ghandour bûn, wan jî xelat da kurtefilmê bi navê *Heft Senfonî*. Parviz Rostamî li ser meqam û muzîka kurdî çêkiriye. *Jiyan* jî xelata Yılmaz Güney ya taybet wergirtiye û derhêner Süheyla Schwenk e.



Her sê endamên jurîya fipresciyê, Yılmaz Özdil, Henk Bovekerk û Alex Timo, xelata xwe da Govenda Alî û Zîn û Meryem Bobani xelata lîstikvana jin ya herî baş bi vê filmê stend. Di filmê Bakûrîyan de Meryem Bobani bi leyistik û axaftina xwe ya soranî xelat distîne û ev jî filmê derhênerê kurmanç Huner Selîm yê bi navê *Welatê Min yê jî Îsotê Şêrîntir* (2013) tîne bîra mirov ku vê carê Mehmet Ali Konarê zaza, wekî bersiv cih daye 3 zaravayên mezin yên kurdî. Konar wekî filmê xwe yê berê *Hewno Bêreng* (2018) xwe ji nîşandana tundiyê ya li ber çavan dûr dike û nîşan û deng û sembolên tundiyê an jî kuştinê dixê çav û guh û bîra mirov. Cihê filmê gundekî biçûk e lê tîkiliya wê bi derve re bêhtir li ser eskerîyê ye û lewra piştî kuştina kurê Dayika Zînê hêj jî di bin çavdêriyê de ne û gef li malbatê tê xwarin. Herweha gundî jî xwesteka Dayika Zînê ya ji bo daweta kurê xwe yê kuştî fam nakin û li hember dertên, heta ku kurê wê yê mezin jî alîkariya çêkirina dawetê dike. Paşê tundiya veşartî careke din derdikeve holê. Travmayek, çawa kare dayik, bira û malbatê wekî din nas û gundî, jê bêhtir jî venêrîna yekser ya desthilatdariyê li ser her tiştêkî berdewam û biryardar be. Dawîya dawî giraniya derbirîna travmayê –ku ew jî bi gera dawetê ye- hemû bedêlên din li ser xwe qebûl dikin.

Xelata senaryoya herî baş çû jî filmê *Okul Traşı* (Hevalders) û derhênerê wê Ferit Karahan re. Mijara filmê tîra xwe balkêş e lewra kurdek radiibe, dibistanên ku zarok bi şev radizên û bi roj jî xwendina xwe dikin, anîye ber kamerayê. Weke ku ji nav meseleyên gelek mezin û sereke berê xwe dabe çend hurgiliyên nav zarok û mamosteyan, weke ku her tiştî bi van yekan ve girêda be û berpirsiyariya van dibistanan xistibe stûyê her kesî. Perwerdehiya sîstematîk û jidûrxistina zarokan ya ji malbatê, qutkirina ji çandê hemû zehmetiyên li ser zarokan e lê li aliyê din malbat û civak derbeyên giran xwarin. Travmaya mezin ew e ku êşek, derdek yan jî çîrokek were berovajîkirin. Ev nîşandaneke sivik û hêsan ya xwendingehan bû.

Erselan Emiri bi filmê *Zalava* du xelat stend, derhênerê herî baş û karakterê sereke yê filmê Nevîd Ferczade xelata karakterê sereke stend. Mixabin ji ber bernamêyên xwe min ev film temaşe nekir. Wekî qedereke nexweş, îja em ê li bendê bin ku ev film bigihîje berdestê temaşevanên xwe yên ji hev dûr.

Axa Kirêt (Dirty Land) Ala Hoshiyar, Reza Alaei ji çîrokeke rastîn dest pê kirine, tevî karakterê wê yê sereke Halo Ramshti, destekî wî di şerê DAIŞê de jê bûye. Piştî vê yekê derdê debara malê dest pê dike û jiyana astengberan çiqas dijwar e mirov dibîne, tevî ku zilam berê pêşmerge bû. Li aliyê din jina wî zexta çûna Ewropayê lê dike û zilam jî xwe li her karî diqelibîne. Di gelek cihan de tama belgefilmê dide û wisa lê hatiye ku perçeyê rastiye her li pêş maye. Halo Ramshti bi lîstikvaniya xwe xelata mansiyona taybet digire.

Bêniştiman (Landless) û derhênerê wê Turaj Aslani bîxelatên festîvalê bûn. Dengvedaneke xweş hebû ji bo film û muzîkjena navdar Hani Mojtahedy tê de xwedî rol bû. Çîrokên penaberiyê yên kurdan her hene û wisa li pêş çarenûsê xuyaye ku dê hêjî hebe. Kurdbûn sertaser dijwariyek e li malê û jê bêhtir jî xerîbiyeke li derva ango koçkirina ber bi derva. Ji filmê meriv kare careke din li ser van ramanan hûr bibe lê wekî hêvîdariyê di dawîya filmê de, zarok tevî ewqas zor û zehmetiyên xwedê dide. Film wekî ceribîneke xweser ya Turaj Aslanî ye ku berê jî di gelek filmên kurdî derhênerîya dîmenan kiriye û ji filmê diyar e ku dîmên tîra dilê xwe balê dikşînin lê berê kamerayê her di nav kamyonê de ye kêman derva xuyaye. Derhêner kiriye ne bi lîstikvanan bêhtir bi dîmen û tevgerên kamerayê çîrokê bihûne lewra bi kûrahî karakter xwe nikaribûn bidin nasîn û hîskirin. Stranbêjiya Hani Mojtahedy di filmê de hebû lê lîstikvaniya wê, rola wê dilê mirovî rihet nedikir. Ev jî filmê Hani yê yekem bû lewra di pêşerojê de cihê kelecane ye ku mirov wê bi lîstikvaniyeke xweş û tevî stranbêjiya wê bibîne.

Di gelek waran ji Bakûr film û kurtefilm bi taybet jî belgefilm hebûn lê hema bêje pirê xelatan ji bo kurdên Rojhilat çûn. Ev jî wekî reqabeteke diyar ya nav festîvalê bû ku rengên ciyawaz yên berhemên kurdan dianî ber çav.

Îsal Serokê festîvalê Emîr Elî, parêzgerê Duhokê Elî Teter, Wezîrê Rewşenbîrî û Lawan Hemey Heme Seîd û Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî di destpêka festîvalê da axiftinên li ser huner û sînemayê kirin ku bi taybet behsa girîngiya hebûn, parastin û berdewamiya Festîvala Duhokê tê de hebû. Mirov bi çavên xwe karibû bibîne ku kîjan alîyên hunermendan bi kîjan alîyan re dê kar bike yan jî ji bo pêşerojê xebatên hevpar bike. Ji rabûn û rûniştinê heta silav û xêrhatinan gelek tişt diyar dibûn. Di roja dawî de festîval bi rastî jî kelecaneke mezin rakir û xelatên hatin dayin û serkeftinên heyî cihê şanaziyê bû.

8. DUHOK

BEST KURDISH FEATURE FILM

DUHOKIFF 2021

8. DUHOK

BEST KURDISH DOCUMENTARY

DUHOKIFF 2021

8. DUHOK

BEST INTERNATIONAL FEATURE FILM

DUHOKIFF 2021

8. DUHOK

BEST KURDISH SHORT FILM

DUHOKIFF 2021

NAVID FARJZADE
BEST ACTOR AWARD

DUHOKIFF 2021

MARYEM BOUBANI
BEST ACTRESS

DUHOKIFF 2021

HOLY BREAD
KURDISH BEST DOCUMENTARY

DUHOKIFF 2021

NAMO
JURY BEST FILM AWARD

DUHOKIFF 2021

SIDIK U PILING
KURDISH BEST FILM

DUHOKIFF 2021

ZALAVA
BEST DIRECTOR AWARD

DUHOKIFF 2021

BROTHERS KEEPER
BEST SCRIPT AWARD

DUHOKIFF 2021

HALIMA ILTER FÜSÜN DEMİREL BARAN SÜKRÜ BABACAN NIZAM NAMIDAR

JIYAN
A FILM BY SUHEYLA SCHWENK

ENTRECHES BELFRONT

GERMAN FILM AND TELEVISION ACADEMY BERLIN

JIYAN
YILMAZ GUNEY AWARD

DUHOKIFF 2021



MÊRDÎNA RENGÎN

MENAZÎR ASLAN KAYA

Mêrdîn bi çand û dîroka xwe bajarekî qedîm e. Li aliyekî bajêr ji mizgeftan banga melayan, li aliyê din zengila dêran tê bihîstin. Vî bajarê qedîm gelek şaristanî û qewm di bin banê xwe de hewandiye. Bi dîrok, çand û keleporekî xwedî cihekî girîng e.



Beriya 7 hezar salî bajar ji xwe re kirine wargeh û gelek şaristanî li vir bicîh bûne. Digel hebûna dîn û baweriyên cûda bi salana di nav aştiyê de dijîn. Dema li nav bajarê qedîm digerin mizgeft, dêr, qesr, medrese û tîrb li pey hev rastî mirov tên. Ji hemû kolan û sûkên bajêr behna dîrokê difure. Bi gera bajêr rêwîtiyeke bêhempa dest pê dîke.

Bajar gelek caran rastî şer û pevçûn û dagirkirina hatiye, lê dîsa jî li ser piya ma ye. Kurd û Ereb, misilman û xîristiyan bi hev re di nav aramiyeke de dijîn. Bajar bi van taybetmendiya xwe jî di nav Lîsteya Mîratên Cihanê yê Unescoyê cih digire. Bi van taybetmendiyan xwe her sal bi hezaran geştyar tên serdana bajêrê dîrokî.

Mêrdîn bi çand û dîroka xwe bajarekî qedîm e. Li aliyekî bajêr ji mizgeftan banga melayan, li aliyê din zengila dêran tê bihîstin. Vî bajarê qedîm gelek şaristanî û qewm di bin banê xwe de hewandîye. Bi dîrok, çand û keleşoran xwedî cihekî girîng e.

Beriya 7 hezar salî bajar ji xwe re kirine wargeh û gelek şaristanî li vir bicîh bûne. Digel hebûna dîn û baweriyên cûda bi salana di nav aştiyê de dijîn. Dema li nav bajarê qedîm digerin mizgeft, dêr, qesr, medrese û tîrb li pey hev rastî mirov tên. Ji hemû kolan û sûkên bajêr behna dîrokê difure. Bi gera bajêr rêwîtiyeke bêhempa dest pê dîke.

Bajar gelek caran rastî şer û pevçûn û dagirkirina hatiye, lê dîsa jî li ser piya ma ye. Kurd û Ereb, misilman û xîristiyan bi hev re di nav aramiyeke de dijîn. Bajar bi van taybetmendiya xwe jî di nav Lîsteya Mîratên Cihanê yê Unescoyê cih digire. Bi van taybetmendiyan xwe her sal bi hezaran geştyar tên serdana bajêrê dîrokî.



MALÊN MÊRDÎNÊ

Bajarê Mêrdînê yek ji bajarên herî qelebalix ên Kurda ye. Piraniya şênîyên bajêr li van avahiyên taybet û dîrokî namînin. Li van cihên dîrokî saziyên fermî, hotel, motel û dikanên geşt û gerê hene. Lewra şênîyên bajêr li cihên din belav bûne niha li van xaniyan ji bo sektora geşt û gerê dikan hene. Restoranên tehm û xwarinên heremî, dikanên zîv û zêran, cil û kincên heremî hêmu li van xaniyan peyda dibin.

Malên Mêrdînê bi kevirêkî taybet tîn çêkirin. Ev kevir jî ji derdora bajêr tê berhev kirin. Malên Mêrdînê havîni ji germê, zivistanê jî ji sermayê dipareze. Derî û dîwarê xaniyan bi motîfên heremî hatine xemilandin. Dema gera bajêr de li kolanan teng û dirêj rastî van neqşan tîn. Niha li cihê dîrokî destura zêdekirin û danîna malen nû tûne ye. Lewra ev cih parastîye. Lê hin welatî bi van kevirên zer yê taybet li hin cihên din e Mêrdînê ji xwe re avahiyan çêdikin. Bi vî awayî avasazî û çanda bajêr didomînin.



DÊR EMER DÊRA MOR GABRIEL

Bajarê Mêrdîn her sal bi hezaran geştyaran diezimîne. Sedema vê yekê jî hebûna gelek bîr û baweriya ye. Dêr Emer jî yek ji wan ciha ye. Ji navenda bajarê dîr e lê digel vê yeke gelek kes diçin serdanê. Dêr li navçeya Midyada Mêrdînê ye. Dêr bi taybetî jî bo Süryaniyan girîng e. Lewra bi sedsalna Süryaniyan dîn û baweriyên xwe li vî cihê elimandin. Li vî cihê pîroz gelek metran, petrik, keşe gihan. Ji bo Süryaniyan piştî Qudsê ev der pîroz e. Dêr beriya 1400 salan hatiye çêkirin û gelek şaristaniyan li Mêrdînê hikm kirine ev dêr bikar anî ne. Herwiha di heyama Împaratoriya Bizansiyan jî gelek cihên nû li dêrê hatine zede kirin. Bi hewl û piştevaniya Împaratoriye gelekî berfireh bû ye. Ev dêr jî wek gelen cihên din bi kevirê Mêrdînê hatiye çêkirin.



DEYRUL ZEFERAN

Li Herêma Turabdinê yek ji cihên gelekî tê dîtin jî Dêra Deyrulzeferanê ye. Welatîyên Suryanî vî cihê wek cihekî pîroz qebl dîkin û îbadeta xwe dîkin. Ev der ji xeynî îbadetê cihê xwendin û îlmê ye. Di hundirê dêrê de peykerên petrikên ku li dêrê jiyana xwe domandine heye. Ev dêr di heyama Romîyan de jî hatiya bikaranîn. Ev pîrozgeh 3 qetiyê û di hundir de dêr û pêşangeh hene.



BAJARÊ KEVNAR Ê DARA

Herêma Kurdan xwedî gelek warên sereke ye. Şaristan ji vê axê li cihanê jî berbelav bûye. Bajarê Kevnarê Darayê jî yek ji van ciha ye. Tê zanîn ku ev bajar ji aliyê Împaratorê Anastasius ve di sedsala 6emîn de hatiye avakirin û ji bo parastina war û cihan hatiye amadekirin. Li derdora vî bajarî sûrên nêzî 4 kîlometreyî dirêj hatine danîn. Bi vê yeke bajar ji şer û dagirkirinê hatiye parastin. Di hundirê vî bajarî de dêr, qesr, sûk, girtîgeh û topxanê hene. Dema li vî bajarê kevnarê diğerin hun rastî gelek xirbe û şûnwarên bajêr tên. Lê ji ber texrîbên mezin di bin axê de mane. Ji bo ji bin erdê derxistina wan sazî û dezgeh hewl didin. Lewra her ku ev bajar tê kolandin di bin de rastî berhem û bermayiyên girîng tên.



MEDRESEYA QASIMIYAYÊ

Mêrdîn ji bo gelek bîr û bawerîyan bajarekî bêhempa ye. Dîn û olên cuda di bin sîwana xwe de dihevine. Digel vê yeke dema hun li bajêr digerin dibe ku li heman sûk û kolanê rastî dêr û mizgeftan bên. Mêrdîn bi şaristaniya xwe ye berfireh xwedî cihên fêrbûnê ye jî. Medreseya Qasimiyê jî tê zanîn ku di heyama Ertuqîyan de hatiye çêkirin. Ji ber ku çêkirina avahiyê 3 sedsalan devam kiriye avahîsaziyeke cûda cûda lê hene. Ev medreseya dîrokî salên borî ji perwerdeya dînî û tîbbî hatiye bikaranîn. Ji medreseyê şexs û kesayetên girîng derbas bûne li vî cihî gihane. Medreseya ku bi salana li ser piya ye bi kevîrên Mêrdînê hatiye çêkirin.



KELHA MÊRDÎNÊ

Keleha Mêrdînê xwedî dîrokeke gelekî kevn e. Li gor gotegot û efsaneyan piştî zayîne (MS) Qralê bi navê Şad Buharî tê kelhê û li wir dimîne. Piştî nexweş dikeve dibîne ku mayîna li kelhê ji bo nexweşiya wî baş tê. Piştê li kelhê qesrekê ji xwe re çêdike û nêzi 12 salan di hundirê Kelhê de dimîne. Ev kelh ji aliyê gelek şaristaniyan ve hatiye bikaranîn. Tê zanîn ku di sedsala 10emîn de bi awayekî rêk û pêk hatiye çêkirin. Kelh 400 mîtroyî dirêj e û 60 mîtroyan fireh e. Kelh ji ber şer û pevçûn û dagirkirinan her çiqasî zirar ditîbe jî piştî 1000 salî jî wek xwe ye û li ser piya ye. Kesên tên serdana bajarê Mêrdînê jî ewilî rastî kelha bêhempa tên.



EMROO

ZANA ZENGENÎ

m.zana47@gmail.com

Emroo!

Te ne sebr e
Ne hedan e
Ne xêreke di heban e
Neçar maye yek daban e...

Emroo!

De ka silavekê ji yarê re bişîne.
De ka vê xeydê ji holê hilîne...

Emroo!

Ev dil û kesera min
Li ser kevçîka dilê min
Hene êş û azarên min
De derbide kula hundirê min...

Emroo!

De ka maçekê ji yarê re bişîne.
De ka vê xemê ji holê hilîne...

Avrêla 2018an

